Azadîa rastî çi ye?

Heker welatek azad e, azadî didit hevwelatîa xu bi axiftinê u nivîsandinê u kumbînê u dînî.

Azadîa axiftinê u azadîa nivîsandinê maf yê hey da beḧsa miruvêt dî bi qencîê yan bi xirabî bit … u maf jî heye da beḧsa seruka wek reîsê Emrîke bi rexnegirî bikin. Çunku bi tinê desthelatdraî ji def Xwidê ye, pêtivî ye em qedirê serukêt xu bigirîn demê em diaxivîn u dinivîsîn. Azadî ne azadî ye heker miruv rêka rast ne çit.

Azadîa kumbînê maf yê hey da ḧeflekê çêkin, yan şulek yan derekê nî vekin, yan li gel miruvêt dî diçin mektebekê da tiştek yan miruvek bêzarî bikin.

Azadîa dînê maf yê hey da miruv 'îbadetê Xwidê dikin wek bi xu divên u dînê xu diguhurrin dînek nî heker divêt – bê tirrsandina êşandinê yan kuştinê.

Fêrkirna rastîê derbarê Xwidê dikevite stuê serukêt dînê da. Ew seruke destheldar bi kumela xu ne çunku ew nîşa miruv dikin Xwidê kî ye. Belê miruv ji axiftina wan bawer dikin çunku seruk mamosta ne u ewan miruva kitêb dixwandîne.

Tu dê xwînî li çîrokê li perê 3, serukêt dînê 'Îsa girt u dadkir u kuşt. Kerrbê wî jê ve îna çunku wî dûrîêt wan dîar kir. Serukêt dînê gut miruva, "Husa bijîn!" belê bi dîv axiftina xu ne ketin. Xwidê kerrbê dûrîatîê jê ve dibit!

Xwidê desthelatî daî serukêt dînê wek yê pêxember Musa. (Rast e, Xwidê li gel Musaî axift u Musaî gut xelkê Xwidê çi digut.) U miruv zanî pêtivî ye pîa fêrkirna wan dikin. Belê heker serukêt dînê rastîê Xwidê nîşa miruva nakin … yan heker nîşa rastîê dikin u pîa axiftina xu nakin … paşî dê kêşe hebin.

Ji berî serukêt dînê 'Îsa girtîn, wî eve gut wan:

> Nexwizîkêt we, ey mamostayêt desturî u ferîsîya, ey dûrînû! Çunku hîn heta dehkêt ne'ne' u sibit u riha zer didin, belê tiştêt gring di desturî da hîn lad din: dadperwerî u diluvanî u dilsuzî. Ewa pêdivî ewe, we her dû bi cih îna ban. Gelî serkêşêt kure, hîn ava xu ji pêşîê paqij dikin, belê hîn ḧêştirê dad'îrin.
>
> Nexwizîkêt we, ey mamostayêt desturî u ferîsîa, ey dûrînû! Çunku hîn perdaẍê u sênîkê ji der ve dişun, belê ji nav da ya pire ji talan u serberdayê. Ey ferîsê kure! Tu li pêşîê perdaẍê ji nav da paqij bike daku ji der ve jî paqij bibit.
>
> - Mizgînîa Mettî 23:23-26

U demê azadîa we ya sîasetê mezin dibit, hişîar bibin hîn fêrkirin yê rast u nedûrî derbarê Xwidê bidin hevwelatîêt we. Bihêlin hevwelatî bi xu hilbijêrin çawa dê 'îbadetê Xwidê dikin. Şulê her êkê ye – u ne şulê ḧemî welat u ḧikmetê ye – da hilbijêrin pîa rastî ve dibin. Bab bu biçîkêt xu ne şên brîardanê bigirin. U husa serukêt dînê ne şên ew brîardanêt bu miruvêt dî bigirin.

Bigire rêkê xirabkarî, ewe bi rex 'Îsaî ve ser xaçê hilawîstî. Ji ber mir, wî rastî hilbijart. Jîan hilbijart. Azadî hilbijart.

Çunku nanê Xwidê ewe yê ji esmanî dête xwarê u jîanê didite dinyayê. … Ez im nanê jîanê. Ewê pêş min ve bêt birsî nabit, u ewê bawerîê bi min bînit çi cara têhnî nabit. - 'Îsa

"Jîn" guvareke tête nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@csçom
© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.